

### Xemla bûkê dê li xwe kir !!!

Di dema niha de , her tişt bervaja ye . Dê ji dêvlî bibe lêvegerek perwerdekirinê , piştî vî temenî mezin ( 53 sal ) , hîn dil heye kincên bûkan li xweke . Ev yek ji sedemên derengbûna kerwana çavê ye û çêkirin û başkirina mala Kurdî pêre di qoşê de ye . Ya dudiyar , semakirina li ber nûçeyan ya ku hin alî pê xelkê li dor xwe dicivînin e. Ew jî devçûn ji çarçewa doza dadmend e û berge ji tewanbarkirina têkildariya rêzdar e . Lewra bilmezî û danûstandina nepîvayî ya hin aliyar, dihêle ku ew di kort û keleman werbin û di her demekê de xwe avis bibînin , pir caran jî hîn qîz in . Gelo ma tu Meyrem din hene ku îse jê peyda bibin ?

Gerku hebe ka îsayê me Kurdan ! . Lê ji bilmeziya xwe ta ku mêrkiribin jî, dîsa dergûşê xwe bi serî nakin û berdavêjin . Ev salên dawiyê yên beravêtina milletê me ye Kurd li Sûriyê ne . Sedemên ku ev rewşa peyda kiriye di nav civaka Kurd de helbet ji kilikbûna mêmî û nexweşiyên civakî yên pilankirî ji aliyê destlatên rijîma tek partî , tek malbat e .Ev komên sedem û encamên wê dihêle Kurd ne xwedî yekhelwest , yekdeng û armancine aşkere û pîvayî bin . Bi ser ve rûmeta me her dem hingavtî ye û ramanên nû her dê werine pişaltin .

Eva rewşa me ya berbat e . Keç xwe dibîne Meyrema qîz ( Ezra' ) û dê ji vê yekê xulemîş dibe . Berî ku qîza xwe bi bûk be , xemla wê bi ser bejn û bala bê bejin perpitî de berdide û temaşevan ( millet ) bi coş û dilgermî jê re li çepikan dixin . wêlomê , keç a bilmez a neçar tezî dadikeve holê û serê dîlanê dikşîne . Ev dîmena jî bi çepik û lîlî tê pejirandin ji hêla nirxevanên rewşa han . Bi vî şeweyî mirov kare milletê Kurd li Sûriyê bijmêre ji milletên beravêtî , tevî ku heyam a guhartinê ye . Kurd dibêjin : Xewa di heyama guhartî de ( destpêka zivistanê , d.payîzê û H.W.D ) nexweşiyar peyda dike . û nexweşî rê li pêş BERAVÊTINÊ dûz û ronî dike .

**Birasozê Sirucî**

### Vestîvala Sindiyane ya çandî

Erê rast e , mûzîk zimanekî cîhanî ye , ji ber wê mirov dikare di riya mûzîkê re , çand û şaristaniya gelê xwe bi gelên cîhanê bide nasîn.

Li 6.8.2010 an , li " Tertûsê" gundê "Melace" , vestîvala Sê li hate lidarxistin . Mîvanê vestîvalê yê herî serekîn mûzîkvanê Kurd ê cîhanî û bi nav û deng "Dilşad Se'îd" bû . Wî bi kemana xwe , çend kîteyên mûzîka xwe yên dengdayî û bi hesteke nazik pêşkêşî vestîvalê kir , û pê beşdarên wê kêfxweş û sermest kirin . Ji wan kîten mûzîkê yên navdayî : Vahîn ( navê keç a wî ye ) , xeceriyê , şivan û kevok bûn.

Hêjaye em berbiçav bikin , ku hejmara niştîyên gundê "Melace" /600/ e, û dora /2000/ kes ji gundên derdorê û hemî parêzgehên Sûriyê li vestîvalê bûne mîvan . Ji wan beşdarên ev hunermend , şewekar û mûzîkvanên bi nav bûn : şewekar "Berhem Haco" – ji Qamişlo- , mûzîkvan " Wesîm Miqdad rêvebirê tîma 'Ewic' ji şam . Mûzîkvanê kemanê "Tarêq îd" , ji amojgeha bilind a mûzîkê ya şamê " Omer Ubêd " şagirtê mûzîkê ji Humsê . Van herçar bîneran pesneke pir hêja dane mûzîka Dilşad Se'îd , ku kanîbû mûzîka xwe ya xweşik û bi wate mîna ava kaniyan a zelal û xerbî û xunava berbangar , bi hêsanî derbasî hinavên beşdarên bikira . Herweha wan tekûz dikirin , ku mûzîka xweşik û nazik , sînor û bendên di nav çandên netewan de hildiweşîne û wan ji hev ve nêzîk dike

**-Memê Alan-**

### Mirinek Sedemên xwe ne diyar in

Riyad Ehmed Xelîl ji Efrînê , gundê Satiya , zayîna wî 1968 , tevî du zarokên wî di mal de , li cindrêse piştî cejna Newrozê tene girtin .

Li pêncşemê 26.8.2010 an nûçeya mirina wî di zîndanê de dighê merivên wî , bêtî ku sedemên mirinê ji wan re bêne xuyakirin . Herweha cendeka wî jî nedan xwediyar . Piştî du rojan ji nişkave , berbanga şemiyê 28.8.2010 kat 4.30 , bi dizî wî di goristana gund de vedişrin .

Bi nava Newrozê em doz dikin ku sedemên mirina Riyad Ehmed bête diyarkirin , û herweha Sersaxiya xwediyên wî dikin

